Welat
81
01/05/2021
Çandî - Gişti - Serbixwe

8 Welat

8 Sal
di Ser Derketina Kovara Welat re Derbas Dibin

PEYVA WELAT

8 Sal di Ser Derketina Kovara Welat re Derbas Dibin

Desteya sernivîs

Di 22ê nîsana 2013an de hejmara yekem ji kovara Welat derket. û xwest ku di nav baxçeyê rojnmageriya kurdî de gulekê nûreng biçîne.
Ji destpêka serhildana sûrî ve, qonaxeke nû hate destpêkirin. Li ser asta Sûriyê bi giştî û rojavayê Kurdistanê bi taybetî gelek guhertin çêbûn. Lewra pêdivî bi ragihandinekê hebû ku bikaribe li gorî vê rewşa nû tevbigere.
Ragihandineke azad û serbixwe be ku bikaribe roleke berçav di vê pêvajoyê de bilîze .
Kovara Welat bi mijarên xwe yên rengereng şêwazeke nû di ragihandina kurdî de da destpêkirin. Di nav rewşeke pir aloz û krîzeke berdewam de kovara welat berdewam kir. Û ta radeyeke pir bilind dikarîbû bibe dengê gel û civakê li rojavayê Kurdistanê.
Hejmar bi hejmar, rewşa deverên kurdî li ser rûpelên kovara Welat dihate raxistin. Hemû krîz û pirsgirêkê aborî, siyasî û civakî ên ku di encama rewşa şer û krîza sûriyê de li deverên kurdî rûdidan, gava bi gav dihatin şopandin.
Kovara Welat guhdaneke mezin û taybet da zimanê kurdî, û gelek mijarên girêdayî ziman û wêjeya kurdî li ser rûpelên kovarê hatin weşandin. Di heman demê de giranî da mijarên girêdayî dîrok, çand, folklor û civaka kurdî.
Her weha bi riya gotarên rengereng gelek dozên girêdayî jinê, zarokan, mafê mirov, demoqrasiyê, pêkvejiyana aştiyane û her wekî din ji mijarên civaka sivîl di hejmarên kovarê de dihatin belavkirin.
Di raporên xwe de, kovara welat girîntirîn mijar û pirsgirêkên civakî û xizmetguzarî destnîşan dikirin. Kovara Welat derî li ber gelek nivîserên ciwan veker û ji wan re bû mîna pencereyekê ku bikaribin di riya wê re nêrînên xwe diyar bikin , bînin ser ziman û biweşînin.
Di dema ku tê de Kovara Welat derbasî sala xwe ya nehem dibe, spasiya wan nivîseran dike ên ku bi pênûsên xwe dikarîbûn rûpelên wê bixemilînin, û hêvî dike ku bi berdewamî pencera hemû nivîserên azad be, û neynika civak û gelê xwe be. ■

Kovara **WELAT**
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî

Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:
welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

تَبَنَّى ثورة
adopt a revolution

MIROVÊ NE TU

Eziz Nesin

Wergerandin: Hesen Xalid

Mirovek çû gundekî ji gundê paşmayî, dema giha, kete bîkabeke taybet de, xwest weke seyranekê li gund bigere, hîn ew di gera xwe de ye, xaniyekî xweşik ji qatekê pêk dihat, bala wî kişand hjmareke gelek ji jin û mêr û zarokan li derdora wî civiya ne...
Ji ajokar ê xwe re got: ev xaniyê ki ye?
Dît ku ajokar bi tore dibêje: xaniyê ne tişto ye ne tiwo xweda wî ji xwe re bibe, ev ew mirovê ku desthilatê şandiye da karê gund bi rêk û pêk bike.
Mirov got: navê wî çi ye?
Ajokar go: bila here dojehê eve navê wî, em jêre dibêjin mirovê ne ti pîse ne tiwe
Mirov matmayî ma, ew dizane ku ajokar mirovekî dilpak e û xwedî sinc e, pa çawa wisa di dermafê mirovekî de, wiha peyvên çewt û gemar dibêje?!
Êvara wê rojê mirov çû çayxana sereke ya wî gundî û bi xwediyê wê re kete şîrovê de û got: çi nerîna te ye di wî fermanberê ku karên gundê we bi rêve dibe heye?
Xwediyê çayxanê “tif” kir û got: ne tiwe gemar e!!
Mirov bi mendehoşî got: çima?
Got: ez bi hêvî me tu pela vî ne tiwî venekî, ne tiwe û gemare pîse pîse pîse !
serê min gêj meke vê şevbêrkê bi vî ne tiwî
Ev mirov bi berdewamî pirsa vî fermanberî ji çi kesê ew didît dikir, tevan weke hev yekbersiv digotin (ne tiwe, gemare, pîs e)...
Di wê demê de wî mirovî biryar da seredana wî fermanberî bike limala wî, da bizane ka ew çi karî ji gundiyan re pêşkêş dike ta wiha evqas gotaran di dermafê wî de dibêjin.
Derbasî mala wî bû tevî hişyariya ajokar, dît ku fermanber şipyaye û li pêş wî cotkarekî pêxwas ku xwîn ji her du piyên wî tê û ew birînên wî derman dike û girê dide û li rex wî berdesta pijişkî alîkariya wî dike
Mirov mendehoş ma û jê pirsî: tu pijîşkî?
Go: na.

Dûvre cotkareke ciwan di destê wê de zarokeke, derbas bû radest kir, fermanber cilkê zarokê jê kirin û di riwê dayîka wî de teqî: çawa te zaroka xwe wiha bihêle belengaz kurmî bûye û pêre zarok şûşt bê dilê xwe ji bihna zarokê bixelîne û hinek bodra toz lê belav kir û bi nazikbûnî destê xwe bi laşê wî de birûanî
Paşî cotkarek hat şêwra xwe pê bike girêdayî çandiniyê, jê re rêka herî baş got li gorî zeviyê wî paşî cotkarek bire rexekî û hin dirav xistin destê wî ew cotkar digrî dema derbas bû xwest destê wî ramûse, ew bilez vegerand û got, çîrok ne di çareserkirina pijîşkî de ye ew di xwarina baş de ye jî.
Paşî ez bi vî mirovî re rûniştim û berdesta pijîşkî ça ji me re anî - ew hevjîna wî bû - me bi hev re daûstand, min ew mirovekî herî baş û rewşenbîr dilpak e
Mirov vegera û li bîkaba xwe siwar bû, ji ajokar re got: te ji min re got ev fermanber ne tiwe?! Lê min ew û hevjîna wî dîtin min ew du perî dîtin, pa çi di wan de ne baş heye?!
Ajokar go: ax ku te zanîba ew çi coreye ji ne tiwa?
Bi tore mirov go: çi ma?!!
Ajokar go: eger min got ne tiwe ew ne tiwe û vê mijarê bigre ji kerema xwe !!
Li vir dînbûna mirov hatiyê û berê xwe da parêzerê gund û rewşenbîrê wê ê herî xuya û jê pirsî: pa ev fermanberê berpirsê gund dize?!!
Parêzer got: qet na !
ew û hevjîna xwe ji malbatên herî zengîn in, dûvre pa tiştekî bi nirx li vî gundî heye were dizîn?!
Mirov pirsî: gelo telefûnên gund ji kar derketine bi sedema wî?!
Parêzer got: telefûn tev ji kar derketibûn, ji dema ev pîs hatî ve tev çalak kirin û xistine kar
Mirov gelekî tore bû ji parêzer re go: dêmek ku gundî evqas jê hez nakin û bi kîndarî lê dimeyzîin û wî ne tu dibînin, çima gilihê wî cem berpirsê wî nakin?!!
Parêzer dosêyek dagirtî derxist û got: fermo ke meyzê, hezarên gilihan hatine şandin, lê ew ji kar ne birine devereke din û wê ev ne tu ser zikê me bimîne?
Mirov biryara çûna ji gund da berî ku hişê wî ji cih derkeve û bibe dîn û hew bi tiştekî digihe. dema çû, parêzer dixatirxwaziya wî de bû li bihnvedana tirênê
Li vir parêzer ji mirov re got: piştî bawerî di navbera wan de peyda bû û ji çûna wî piştrast bû, tiştek heye dixwazim ji te re bibêjim berî tu herî, ez û gundiyan tev gehane baweriyekê piştî ezmûna me bi desthilatdariyê re Ku ew dema fermanberekî giştî baş dişînin em û ew dikevin kirasê hev de deshilatdar di kêlîka xwe de wî dibine deveke din tevî em dixwazin bimîne...

Em gehan wê baweriyê, çiqas gilih û gazind û kîndarî ji gundiyan hebe derbarê fermanberê giştî de, ewqas berpirs û desthilat dixwaze wî bihêlin li wê deverê

Lewre me tevan weke rêkeftinekê girêdaye ku em sêvan û gotinên çewt û ne di rê de jêre bidin, û pesnên herî kirêt di dermafê wî de bidin da bimîne li nav me?

lewre em pîsbûna wî û ne tibûniya wî eşkere dikin û tim gilih û gazindan ji berpirsê wî re dişînin, da wî dûrî gund nekin

Û bi vî şêweyî me dikarî wî li gund bihêlin,

ev çar sal çêbûn e wiha

Ah û Ah heger me bi karîba wî çar salên din jî wî bihêlin li gund, wê gundê me bibe buhişt bi xwe...

العشق والخيانة بالدراما الاجتماعية للموسم الدرامي2021

بسام سفر

الدراما التلفزيونية تعيش حياة بعيدة جداً عن الحياة الطبيعية الإنسانية, فهيا تبدأ من الحروف التي يكتبها المؤلف الدرامي لتختزن في ورق أو ملف إلكتروني, وتذهب إلى يد منتج ومخرج ومهندس ديكور وممثلين وفنيين لتصبح جسداً وروحاً متكاملة قابلة للحياة والعرض على شاشات تنقل حياة العديد من البشر إلى شاشة صغيرة تعرض وتشاهد من ملايين الناس, وتعيش معهم ساعات مختلفة في التلقي, وفي كل موسم درامي يكشف في عروض شهر رمضان الفضيل حيث تعرض حياة هذه الشخصيات الجديدة تحتل حيزاً كبيراً من لحظاتنا الإنسانية وتعيش معنا نفكر بها ومصائرها وماضيها, وكيف وصلت إلى لحظات جديدة.

هذه المحاكاة لحياة الناس من خلال فعل درامي إنساني تدربت أغلب شخصياته على عيش لحظاتها أمام الكاميرا.

ثنائيات العشق:

يحمل كل موسم درامي بعض السمات الخاصة به بعيداً عن المواسم الدرامية السابقة, فالسمة العامة لهذا الموسم هو معالجة قضايا الحب بطرق وأساليب مختلفة, وترتبط بها النقائض التي يعيشها العشاق من خصام وزعل وحرد والابتعاد والفراق, والعودة والمصالحة والحب, والهجر وصولاً إلى الكراهية.

هذه الثنائيات العشقية التي تشكلت في عدد من الأعمال الدرامية يمكن فرزها ورصفها في السياق الدرامي الخاص بكل عمل من الأعمال الدرامية السورية,

بعد عدة سنوات:

العشق والحب هذا الموسم برز «بعد عدة سنوات» من تأليف بسام جنيد, وإخراج عبد الغني بلاط, وإنتاج المؤسسة السورية للإنتاج التلفزيوني والإذاعي, وبطولة عدد من الثنائيات العشقية" أبو نورس, علي كريم" و"أم نورس, حنان شقير" اللذان هما أساس كل الثنائيات في العمل بداية من "نورس, سوار الحسن» الذي تزوج من ابنة الجيران نتيجة تخطيط أخيها» رضوان, وسيم الرحبي" مع أخته" هدى, ريم زينو", هذا الثنائية التي لعبت من خارج العائلة لاقتحام حياتها والسيطرة عليها من أجل مطعم لرضوان من فلوس» أبو نورس», وهذا ما يحصل لاحقاً.

يدرك أبو نورس ذلك لاحقاً دون أن يستطيع فعل شيء لكشفه قبل موت العائلة. هذه الثنائية المالية بعيداً عن الحب والعشق, وإنما إطار الخيانة تطلق هدى نورس وتتزوج من» سامر, محمد حداقي" في مشروع مالي غرضه تنمية المال من بوابة الحب وإيجاد الذات, لكن ذلك كله في معيار» هدى, سامر» غير فاعل وواضح. بدليل أن سامر عاش حالة حب وعشق مع ابنة معروف قبل أن ينتحر حيث أجرت مجموعة أولاد شارع لضربه وأهانته فما كان منه إلا أن ينتحر.

الثنائية العشقية الثانية تبدأ من» معروف, سعد مينه" الذي أحب ابنة الجيران "هند, نانسي خوري", وضعا عالماً عشقياً خاصاً بهما, لكن الرياح لا تجري بما تشتهي السفن حيث يتسبب معروف بعمى ابنة" سلوى, ريم عبد العزيز" صديقة والدته, ما يدفعه لزواج منها" مريم, لما بدور", وتتعطل عجلة عشق معروف بالمعنى الشكلي أربع سنوات حتى يلتقي بهند وهي قادمة لزيارة أخته» أميرة, روبين عيسى», وتفتح كل حكايا الحب القديمة, ويعود ليشتعل هذا الحب من جديد, فجذوته كانت تحت رماد عدم المشاهدة واللقاء ولا تنتهي إلا بالزواج من هند بعد موافقة زوجته الأولى مريم.

يعود معروف بعد سفر وعمل لإقامة مشفى خاص به وللحب مرة ثالثة, بعد مرض زوجته هند, وفي كل مرة يقاتل ويدافع معروف عن حبه بذات الروح الحماسية, وكأنه يعشق لأول مرة، فالخيانة الأولى لهند كانت مريم والخيانة لهما كانت الزوجة الثالثة.

أما الثنائية العشقية الأجمل في» بعد عدة سنوات» هي»جمال, ميلاد يوسف», وحبيبته وزوجته لاحقاً بعد خروجه من السجن» هيلين, رنا العظم", فهي طيلة العمل الدرامي تحمل العشق الخاص في الضلوع إلا في لحظات ضعف عندما كان في السجن, ومع صديقه» سامر» الذي قدم ذاته لها, أنه مخلص لجمال وأنه لن يستغل لحظات ضعفها إلا أنه استغلها, واستفاقت» هيلين" لتعود إلى طبيعتها التي لن تغادرها لاحقاً.

وصاحبة الثنائية العملياتية في العشق التي كانت تنمو أمام عيناها, وبرعاية المعلم أبو نورس، كانت بين» ضياء, كرم الشعراني»و» عفراء, علا باشا»، دون اللقاء المباشر نتيجة المسؤولية التي تحملتها طيلة حياتها حتى تخرج أخيها سامر, وفصوله الناقصة معها, ورغبته في بيع البقالية التي لا تملكها أخته, وإنما هي لأبو نورس. هذا كله جعل من لقائهما لحظة فرح مبهجة في العش الزوجية.

وتبقى الثنائية غير المكتملة من زاوية الشرعنة المجتمعية هي للمحامية» أميرة, روبين عيسى», وحبيبها الذي أحبته منذ تقدم لخطبتها في المرة الأولى, ولم توافق من أجل أخيها, وابنته أخيها وأبيها, لكن بعد هروب زوجته الأجنبية من سوريا عاد إليها طالباً العشق والحب, وحصل عليها قبل وفاتهم جميعهم في قذيفة أحرقت شقتهم وماتوا.

ضيوف على الحب:

العمل الثاني الذي يستحق الوقوف عند وفق معيار الثنائيات العشقية ونهاياتها الدرامية هو» ضيوف على الحب» من تأليف سامر محمد إسماعيل وإخراج فهد ميري, ومن إنتاج المؤسسة السورية للإنتاج التلفزيون والإذاعي.

يشكل الحب البوابة العريضة للعنوان الذي يفتح العمل الدرامي على الحياة السورية الشبابية ما بعد الحرب التي عانى منها المجتمع في البيت العربي الشامي عند (صباح, شكران مرتجى), فنجد المطرب المغني» زهير, عاصم حواط", الذي يحب "نورا, رنا العظيم" التي تعمل في مطعم بالشام القديمة يهجرها أمام إغراء السفر إلى الإمارات للعمل ويعود إليها عندما يفشل المشروع, ويخونها عندما تغتصبه" إنانا, رشا بلال" الساكنة الجديدة في البيت عند صباح وفي الحلقة الأخيرة يخرج من ثنائية العشق إلى العمل ليصبح مغني راب، ومع تخليه عن نورا تعشق زميلها في المطعم البارمن, ويشرعان في إجراءات الزواج.

أما الثنائية التي تظهر في بداية الحلقات الأولى هي « نورس, كرم شعراني" الذي يحب " منال, رنا كرم" زميلته في السكن ويعملان مع "نزار بيك, زهير رمضان" في الشركة التي تتاجر بالأعضاء البشرية, وتصريف العملة, يسجن نورس, وتقف إلى جانبه منال لكنها تكتشف أن العمر يجري, وأمامها أخ نورس «جهاد, بلال ماردينى" الذي غادرته حبيبته إلى فرنسا لتكمل دراستها وتعشق شخصية أخرى, فيجري تفاهم معلن للخاسرين في اختبار أكمال حياتهما معنا بالزواج.

والمحامي المتدرب» رامي, علي سكر» والصحفية» لارا, خلود عيسى" متحابان في بداية العمل، يتخلى عنها ويبيعها أمام عرض أستاذته المحامية" ميرفت, هيا إسماعيل" بالزواج والوصول على كافة المستويات, إلا أنه يحاول العودة إليها في لحظة خلاف, ترفض وتطرده شر طردة.

ويحاول صاحب المحطة الفضائية والموقع الالكتروني» حيان, وضاح حلوم" استمالة لارا إليه، لكنه يفشل، ويقيم علاقة مع مذيعة متدربة» سيرين, هبة زهرة». بينما ينجح الفنان» فايز قزق" حيث تخرب عليها ابنة زوجته إنانا, التي تبقى معه حتى نهاية العمل. بعد أن تقطعت ساقاه نتيجة تطور مرض السكر.

والثنائي الطبي الدكتور» مجدي, فادي صبيح» والممرضة» رغد, جيني أسبر» المتزوجان ويعملان في ذات المشفى, يتخلى عنها نتيجة ضغط أسرته وأهله دون طلاق, حتى تختار الحياة مع» توفيق, جرجس جبارة» الذي يشكل دعماً حقيقياً لها, ويجبره على تطليقها, ويتزوجان إلا أن عودة أبنه» فوزي, كناز سالم» ينكد ويجعل حياتهما لا تطاق, ويموت توفيق, ويصفي فوزي كل أملاكه ويغادر إلى أمريكا إلى حيث زوجته وأولاده, بينما تحصل رغد على الفيلا التي كتبها توفيق باسمها.

على صفيح ساخن:

العمل الذي لا تظهر فيه ثنائيات العشقية هو على صفيح ساخن بينما هي موجودة وتحتل موقعاً متقدماً منه، أولى هذه الثنائيات العشيقة بين» رواد, سليمان رزق» نباش من مجموعة» زهير الطاعون, سلوم حداد», قبل أن يطرد نتيجة علاقته ب» تمارا, جنى العبود « وتبقى رغم كل الضغط متمسكة به حتى يتم عقد زواجهما بحضور (الأغا, عبد الفتاح المزين).

وثاني هذه الثنائيات العلاقة بين»شمس, سمر سامي» و» هلال, باسم ياخور" التي تقدم له كل مفاتيح الحياة بالطريقة التي ترغب بها بعد وفاتها.

ومن أهم ثنائيات الحب تظهر بين" هاني, ميلاد يوسف"و "ريما, علياء سعيد" وتكون نتيجته ابنتهما حيث التماسك الفعلي في مواجهة الحياة والعائلة التي تمردت ريما عليها, فالأب» سليم صبري, أبو طاهر» والأخ حاولا الضغط المتواصل عليها, إلا أنها لم يغير قناعتها تجاه هاني, إلا أن هاني لم يدقق في الأخبار التي أوصلها له "أبو كفاح, محمد قنوع» نقلاً عن «نسيم, سيف الدين سبيعي".

أما الثنائية المتغيرة والمتبدلة مثلما هي الحياة» هند, أمل شوشة" التي تزوجت نسيم, وبعدما طلقها, إقامة علاقة مع» رامي, بلال ماردينى", وأبعدته عن طريقها. وهناك ثنائية كلاسيكية وتقليدية جداً هي» أم كرمو, نظلي الرواس" و "أبو كرمو, عبد المنعم عمايري".

والثنائية المنفلتة من كل الاعتبارات» عياش, يامن حجلي», وزوجته وابنهما الذي احتاج نقي العظم من والده لكي يبقى حياً, وهي مطلقة ومتزوجة من رجل آخر سجل الطفل باسمه.

من ما تقدم نستطيع القول أن دراما٢٠٢١, اهتمت كثيراً بقضايا الحب والعشق, ونقيضها الخيانات العاطفية والجنسية, هاربة من القضايا الحياتية والمعيشية الإنسانية للشعب السوري بعيداً عن» المازوت, الغاز, السكر, الرز, والخبز, والبنزين», ولم تستطيع أن تكون دراما٢٠٢١, مرآة للواقع السوري, وإنما مرآة لتصورات درامية صنعها كتابها ومخرجيها بعيداً عن الحياة, رغم أن» على صفيح ساخن» اتسم بالواقعية الدرامية لفئة مجتمعية مهمشة في الواقع السوري, وظهر البذخ الإنتاجي فيه أكثر من العملين الدراميين الآخرين.

FERHENGOK

Hesin	حديد
çingo	زنك
sifir	نحاس
zêr	ذهب
zîv	فضة
fafon	ألمنيوم
polat	فولاذ
metal	معدن
komirr	فحم
sotemenî	محروقات
ardû	وقود
wize	طاقة
çira	مصباح
mûm	شمع
êzing	حطب
text	خشب
terraş	دغل
darbirr	حطاب
bivir	فأس
birrek	منشار

DÎLAN ŞEWQÎ:

"Helbestvan dikare bibe romanivîs. lê romannivîs nikare bibe helbestvan"

Hevpeyvîn: Imran Yûsiv

Dîlan şewqî di sala 1970 de li bajarê Serêkaniyê ji dayik bûye.

ji sala 2000an ve heya 2010an li şamê dijiya. Li wê derê helbest ji zimanên kurdî û turkî werdigerandin zimanê zimanê erebî û û di kovar û rojnameyên erebî de diweşandin. Gelek ji helbestên Mehmûd Derwîş Nazim Hikmet wergerandine zimanê kurdî û erebî.Aniha li Turkiyê li Kulo dijî, ew bajarok girêdayî bajarê Qoniyê ye, şêniyên wê û gundên derdora wê giş kurd in.

-Çîroka we û nivîsandinê çawa destpê kir, derbarê wan destpêkan de hûn çi dikarin ji me re bibêjin?

Ji zarotiya xwe de tiştin ne normal bi min re çêdibûn, wek ku ez ji qerebalixê direviyam. Dema ko kesekî li ber min çîrok digotin, ez di xew re diçûm. min tiştin ko tu zarokê di temenê min de nakin dikirin. Ez deh salî bûm, dikana bavê min ya şînatiyê hebû. Bavê min diçû etariyê, ez gelek caran pê re diçûm nav gundên ereban, û bêtirî caran bavê min diçû etariya xwe ez li ber dikana wî dimam. Carnan, deh rojan ez dimam. Kalek hebû, ew dostê bavê min bû, ew bi destekî bû, min nikarîbû ez dikanê vekim û bigirim ji ber ko destê min ne digihaşt ciyê mero qiflê davêjê, wî kalê bi piyekî ji min re deriyê dikanê digirt û serê sibê dîsa dihat derî vedikir.

ji ber ko ji zarokên diya xwe ez a mezin bûm, dema ko bavê min ne li mal bû ez diçûm ber firnê û ez diketim dora nan, carna ji qazîve ez li dawiya dorê disekinîm û min li dîmenê temaşe dikir.

Êvaran, dema ko civatên malbatî li mala me çêdibûn, bihna min teng dibû ez derdiketim hewşê. Lê pirê caran di wî temenê piçûk de dilê min dixwest ko ez li wan kêlîkan di rêyeke dirêj re bimeşim, rêyeke tarî û bêdeng ko ez nesekinim û

tim bimeşim.

Ji piçûkaniya min de ez li ber stranan digiriyam û hîna stran perçak ji min in.

Dema komkujiya Helepçê çêbû, min helbesta xwe ya ewil bi kurdî nivîsand û ji wir de min destpê kir.

-Helbest ji bo we çi wateyê dide?

Helbest nefesa min e, ez wê nabînim ji ku tê, çawa tê meyandin, û ez çawa dibim? ez nizanim. Lê ez nikarim bê wê bijîm, ew bihna min e. Dema ko ez helbestekê bidawî tînim, ez di hundur de hilnayêm, ez dixwazim derkevim derveyî malê.

-Tiştên ku helbestvanek ji we çêkir, çi bûn?

Hewşa me ya ko tije dar û bexçe û gul bû. Diya min jineke ne wek jinên din e, dema em li welat bûn, diya min ji malê dernediket, li ber derî rûnedinişt, karê wê çandina gul û daran bû. Destpêka nivîsandina xwe de, ji ber ko hewşa me şînkayî bû cîran û dost gelek dihatin mala me, dora min vala nedibû, nîvê şevê ez li pênûsê vala dibûm, ji bo kes şiyar nebe min di tariyê de ramanên xwe dinivîsandin, û roja dinê yan ko kengî keys min lê dihat min ew raman sipî dikirin, di wan salan de nexweşîk dil bi min re çêbû, her ko ez bi şevê şiyar dibûm û min tiştek dinivîsand, roja dinê diya min pelê min diqetandin, ev mesele bi dehê caran çêbû, diya min digot : "xwe newestîne tu nexweş î " wê qetandina pelikên min ji min re qewetek zêde bû, hêza ko ji bo nivîsandinê di hundurê min de bû, min nizanîbû ew çiye û çawaye, lê hêza min tim dikeliya û difûriya û di ser re diçû.

-Di helbestên we de, tiştê ku bala min kişand ew zimanê hêsan û herikdar bû, lê di heman demê de gelek wêneyên bedew û wateyên kûr radigihîne ... derbarê bikaranîna wî zimanê bedew di helbestên we de, hûn çi dikarin ji me re bibêjin?

Tiştê ez dixwazim bêjim ko ne tenê tecrube dihêle helbest helbest be, xwendin ya giring e. Ya min, min ne tenê pirtûkên kurdî dixwendin, lê min pirtûkên bi zimanên turkî û erebî û kurdî dixwendin. Min gelek pirtûk wergerandin, vê bixwe zêdebûnek da destê min û destikên min yên helbestê. Lewra berhemên min taybet in, û zimanê wan berfireh e, xwendina bi zimanekî zêde zengînî ye, û bandora wê gelekî li nivîsandina helbestê heye .

-Hûn keça Serêkaniyê ne, vî bajarî çiqasî bandor li we kiriye û çiqasî cihê xwe di helbestên we de girtiye?

Bandora serêkaniyê li jiyana min gişî heye, û bi taybet li ser nivîsandinên min, ez bi bîranînên jiyana xwe ya li Serêkaniyê ber xwe dibînim, ew bajarê ko bavê min yê şêst salî tê de ez serbest hiştibûm, mîvanên min yên xort ji mîvanên birayê min bêtir bûn. Li Serêkaniyê karê rêxistinî dikir, û min pitûkên xwe yên ko min ew wergerandin li wê derê wergerandin. Mamostê min yê zimanê kurdî ji Serêkaniyê ye, û mamostê ko helbesta kurdî bi min xweş kir ew jî ji Serêkaniyê ye. Min du pirtûkên helbestî yên ewil li wê derê nivîsandin û min dilê ewil li wî bajarê xweşik girt, min xwendina xwe li wê derê rawestand û bavê min li dû me li wê derê ma. Me bajar emanetî xwedê û goristana wê derê kir.

Heya niha, dema ko ez dinivîsînim ez berê qedehek ji bîranînên xwe yên li Serêkaniyê vedixum, dûre ez dinivîsînim. Heta dema ko ez Yoga dikim , ez lotisa ko li derdora kaniyên wî bajarî şîn bû tînim bîra xwe, çavên xwe digrim û bihna Serêkaniyê dikşînim ko heya em hebin wê ew jî hebe.

-Di gelek helbestên we de bêhina jinê, naziya wê, germahiya hestên wê, bedewiya wê, eşq û evîndariya wê, êş û azarên wê diyar in.. bi dîtina we çi cudahî di helbesta jinê de heye?

Ji ber ko jin hestkare divê helbesta jinê bi ast û naverok û bihna xwe bilind be, divê ew bi êşên jinê, bi bindestiya wê û bi dilovaniya wê hatibe sitran, helbestên jinê divê wek jinê be.

-Aliyê wijdanî di helbestên we de pir xurt e, û em vê yekê kêm caran di helbesta kurdî de dibînin, çawa we dikrarîbû bi vê şêwaza ku gelek rastî tê de heye binivîsin?

Ez nikarim bersiva vê pirsê bidim, ji ber ez nizanim çawa dinivîsînim û kengî û li ku derê helbest dimeye, nayê bîra min, nimûne : wê rojê ez serê sibê bi xaltîka xwe re çûbûm nexweşxanê, helbest bi dora min ket, min çuqasî xwe ji ber wê da alî, min nikarîbû, dawiya dawî ez rûniştim, min telefona xwe derxist û min destpêka wê nivîsand ji ber ko destpêka helbestê wek teyrê baz e ko te ew ne



girt wê bifire tu nema karî wê bigrî.

Ez dibêjim xwepêşxistin berhemên ciwan dide. Ji bo mero bi helbestê bilind bibe divê mero nekeve çav xwe, mero rexna navêje û mero xwe di ser kesên ji xwe kêmtir re nebîne, her rexnak ji mero re lêvegerek e, tu rexnê vala nayê ilem wê ew nêzîkî kêmaniyekê be, lewra divê rexevanê ewil mero bi xwe be. Berî ko ez helbestê rê kesekî bidim, ez bîst yan sîh carî dixwînim, ez li hevokan li newaza hundur li pevgirêdana wêneyên helbestê bi hevdû ve ez li vana tevan dinerim, heya ez wê ji xwe azad dikim ez deh caran difirim û dikevim û dimrim.

-Em derbas bibin warê romanê, jixwe we çend roman jî nivîsîne, çawa helbestvanek dikare bibe romanivîs, û we çawa dest bi nivîsa romanê kir?

Helbestvan dikare bibe romannivîs. lê romannivîs nikare bibe helbestvan.

Ez ji sala 2013an de romanê dinivîsînim, ew êdî bûye xwarin û vexwarina min, min çawa biryara nivîsandina romanê da? Ev jî ji min re wek şoreşekê bû, ez bixwe jineke bihnteng im, bûyer di serê min de nema hildihatin, lê min newêrîbû destpê bikim ji ber ko ez fêrî bihna helbestê ya kurt û hênik bûbûm. Dûre rewşa min alî min kir ko ez xwe bavêjim derya romanê, mala min dûrî xelkê û qerebalixê bû, hevjînê min bi rewşa min re alîkar bû, zarokên min çênebûn û xweşbûneke ko ji bo nivîsandina romanê li dora min hebû, yanî demê ev derfet da min ko ez hunera xwe ya nivîsandina romanê derxim holê. Dema min romana ewil bi dawî anî û min ew şand ji gelek nivîskar û torevanan re ji bo nerînên xwe bidin, kesekî ne got: kêm e yan qels e yan dev jê berde, bi vî rengî min xwe di nav sînorê romanan de dît û ez ketim nav raman û bûyeran, ez têde çûme xwarê û heya niha ez tê de me.

-Di navbera helbest û romanê de, hûn ji kîjanê bêtir hez dikin, û we çi têkilî di navbera herduyan de vedîtiye?

Wek min berê got, helbest nefesa min e, ew oksicîna min e, lê roman xwarin û ava min e, tu têkilî di navbera helbestê û romanê de tuneye, helbest bi hestan destpê dike, heya mero wê dinivîsîne hest wê kêlîkê winda dibin yanî helbest hevîrekî ji hest û wêne û gotinan e, lê roman ew tiştekî din e, roman ne çîrok e, ew karekî ko mero bi kesên di romanê de û bi hemû bûyerên ko dûre tên, mero li ser neqşê wan dixebite. Roman bi ramanekê destpê dibe, dûre hest û bûyer û çîrok û kelecan tên.

-Berhemên we ta niha çi hene, çi ji wan hatiye çapkirin û weşandin, û çi ji wan maye, û ji bo pêşerojê çi projeyên we hene?

Pirtûkên helbestî yên çapkirî :

1 Ramûsanên sor.

2 Hevdîtina pêxemberan.

3 Ez tevde pencere me.

Yên ne çapkirî û amade :

1 **çavên şefeqê vedibin.**

2 **li biyaniyê dilê min kor bû.**

3 **çend helbest ji diya min re.**

pirtûkên wergerandî û çapkirî :

1 bîranînên Cegerxwîn , li qamişlo hat çapkirin, ji kurdî heya erebî.

2 dîwana helbestvan Ahmed arif (min ji ber hesreta te qeyd şikandin) ev li Dubeyê hat çapkirin Sema kurdê ew çap kir ,ji ber ko ew berê wergerandîbû zimanê kurdî min xwest ez zimanekî li wergerandina pirtûkê zêde bikim lewra min ji tirkî wergerand zimanê erebî.

Du sê pirtûkên helbestî, ew jî li şamê di riya hevgirtina nivîskarên ereb yên sûriyê de hatin çapkirin.

Romanên belavkirî :

1. **Xato , di Pênûsa nû de li ser xelekan belav bû.**
2. **Şekirê di bêrîka bavê min de, Evesta çap dike.**
3. **Deh rojan li nexweşxaneya lêkolînê (odeya 219) li Amedê çap bû.**

romanên ne çapkirî :

1 **Zarokê min .**

2 **Danûk.**

3 **Terpiyê Narê**

4 **Ez ne diya wanim.**

-Gotina we ya dawî?

Spasiya malpera welat dikim spasiya we dikim hûn tim hebin

MELE EHMEDÊ NAMÎ (1906-1975)

Yek ji rewşenbîr û ronakbîrên kurd e.

Ehmedê Namî di sala 1906an de Li gundê Erbetê qeza Nisêbînê, Bakurê Kurdistana ji dayik bûye.

Ji temenê heft saliya xwe ve, li hicrika feqehan dest bi xwendinê dike.

Di wê hicreyê de, Nûbihara biçûkan ya Ehmedê Xanî, zanistên olî, Qurana pîroz û şerîeta islamî dixwîne. û di hicrikên Êstilê, Kercosê, Dara, Hicrika Seyda Mele Ubeydulahê Cengîrî (yê bi navê Mamostê Gewre dihat nask irin) li Amûdê, Xizna, Girê siwêr û Tilşeîra Aşîta. li van hicrikan xwendina xwe berdewam kir û li hicrika Seydayê Şêx Îbahîmê Sofî Evdo li Gundê Tilşeîrê " îcaza bidawîkirinê" wergirt û bû melayê wî gundî.

Li gundê Tilşeîrê, jiyana wî ya wêjeyî, û çalakiyên wî yên civakî, welatperwerî destpê dikin, û wekî rewşenbîrekî û ronakbîrekî kurd roleke pir girîng û mezin dilîze.

Têkiliya wî bi rewşenbîrên kurd ên di wê demê de pir xurt bû, nemaze endezyarê zimanê kurdî û xwediyê her du kovarên zêrîn (Hawar û Ronahî) Mîr Celadet Bedirxan. Namî gelek helbest û nivîsên xwe di kovarên Hawar û Ronahî de diweşandin.

Di warê xebata kurdewariyê de, Namî kesekî pir çalak û bi rol bû. di destpêkê de tevlî komeleya Xoybûnê dibe, û tê de dibe berpirs. Her weha berpirsyartiya Civata Arîkariyê ji bona Belengazên Kurd li Cizîrê û Nadiya Ciwanên Kurd li Amûdê dike.

Namî li ser rêbaza mamosteyê xwe Mîr Celadet Bedirxan karê fêrkirin û hînkirina zimanê kurdî dikir, û li gundê Tilşeîrê mîna dibistanekê çêkiribû, tê de kinc û kal fêrî ziman û wêjeya kurdî dikiririn.

Mîna ronakbîrekî, Namî şerê nexwendinê dikir û ji gelê kurd dixwest ku zarokên xwe bişînin dibistanan û wan bidin xwendin, çimkî wî dizanîbû ku xwendin û zanîn bingeha pêşketin û azadiya gelê kurd e.

Piştî vekirina dibistana fermî a kuran li



gundê Tilşeîrê, Namî bi bîrweriyeke pêşketî û vekerî doz ji berpirsiyarên birêvebiriya perwerdeya parêzgeha Hisiçe-Cizîrê- dikir ku dibistaneke taybet bi keçan li gundê Tilşeîrê vekin. Dawî biryara vekirina dibistanek e keçan li gundê Tilşeîra Aşîta wergirt.

Di sala 1951 an de, mamosteya dibistanê, keçek e Kurd bû, şagirtên dibistanê her roj di civîna sibehê de, sirûda niştîmanî a Sûriya û helbesta Namî ya bi navê "Neşîd û Gaziya Keçan" digotin.

Ji ber kar û xebata wî ya siyasî de, Namî gelek caran hate zindankirin.

Di roja 11.12.1975 an de, piştî nexweşiyek dirêj, Namî koça dawî kir û li goristana Qidûr Beg li bajarê Qamişlo hate veşartin.

Berhemên Namî yên çapkirî:

Dîwana helbestan ya bi navê "Daxwazname". Çapa yekemîn, ji weşanên "Roja Nû", di sala 1986 an de li Swêd, hatiye şapkirin. Çapa duwemîn di sala 1998 an de li Bêrûtê, Liban, hatiye çapkirin.

Agirê Sînema Amûdê, pirtûk, ji weşanên "Jîna Nû 12", çapa yekemîn, di êlûna sala 1987 an de li Upsala, Swêd hetiye çapkirin.

Pirtûkên neçapkirî:

Ferhenga Kurdî û Erbî ya bi vavê "KOZAR", li benda çapkirinê ye

. Rêzimana Kurdî û Erebî

. Çiko li Bîr im, hin ji bîranînên Namî ne

...السلك اللعين

جوان سلو

....

كمن يخلع حذاءه أمام باب حرمٍ مقدس، هكذا دخلت مدينة الرقة الفراتية، فقد خلعت عن نفسي كل صور الأيام السابقة، ومشيت نحوها هائما، حزينا، تطوح بي الذكريات، لتعجنني الذكرى بيديها المتشققتين، وتئدني تحت تراب المدينة الرطب، تهزّني، تصعقني، تتركني طريح الماضي.

ما إن عبرت النهر واجتزته، حتى تركت العالم الخارجي الحقيقي وراء ظهري، عندها اختفت مظاهر الحياة عنها، فقد أصبحت الرقة كعجوز طحنها الزمن بحجارة صوانه، فما بادت تقوى على المسير، تلك المدينة التي كانت تغفو على ضفاف الفرات والهادئة كنسيم النهر العظيم، بات يحدوها الخراب من كل الجهات، أبنيتها التي تحولت إلى هياكل إسمنتية، عاشت الفوضى بكل أنواعها، وشوارعها ارتسمت بالألم، وراحت تلملم جثث قتلاها عن قارعة الطريق، أو تتركهم تحت أنقاضها، تفوح منهم رائحة الموت الأسود، فما إن دخلتها حتى علمت أن الله قد تخلى عنها، حين صارت تحت حكم مُدّعي الإسلام، وأنهم حولوها إلى مدينة أشباح لا يسكنها إلا الدمار.

لم أجد هناك ما يسدّ نور الشمس الحارقة، أواخر شهر تموز عام ٢٠١٧، إلا ستائر مثقوبة مهترئة، تفصل بين الشوارع، فعلى إحدى جهات الطريق، يسكن عناصر داعش وأسراه المدنيين، وعلى الطرف الآخر من الشارع نسكنُ نحن - عابري المدى- عطشى الحرية، وقد أقسمنا أننا لن نسعد، إلا بعد أن نخلص الأسرى المدنيين من ساكني المدينة، وأهالينا الإيزيديين المختطفين من أيديهم، حينها سأشعر أنني وفيتُ بوعدي لرفاقي الشهداء، وأنني أطلقتُ رصاصاتي في قلب الإرهاب ذاته.

تأملتُ المدينة من بعيد جيدا، كانت الأدخنة تتصاعد مع أصوات استغاثات أهلها وساكنيها، محاولة شقّ حدود السماء، لعلّها تجد صدى لدعواتهم المريرة، وكلما ازداد تقدمي صوبها، أحسستُ بهول المصيبة، وعظمة الواقعة على نفسي، وكأنها جبل عظيم من الهموم، يرقد فوق صدري، لتتشارك الهموم مع وصايا رفاقي الشهداء، جاعلة من هذا التحالف الغريب بين الوصايا والدعوات، رصاصات تستقر في قلبي، وتؤنّبه على تأخره، طالبة مني الإسراع وحثّ الخطى، في مشاركة رفاقي المقاتلين لتحرير المدينة من ظلم التنظيم وممارساته المجحفة بحقها وحقّ أهلها.

فور وصولي إلى المدينة المنكوبة، طُلب مني أن أدخل إحدى الأبنية، لأرصد منه تحركات عناصر داعش، مستعينا بقناصة الشهيد «ريدور»، والتي أردتُ أن ترافقني بدلاً عنه، وتحارب باسمه، لتنتقم له من فاقدي الإنسانية.

دخلتُ مجموعتي المكونة من خمسة أفراد المبنى بعد الظهيرة الحارة محني الرؤوس، نتخطى في مرورنا تلك الرصاصات الموجهة ضدنا، القادمة من الجهة المقابلة لنا، حين عبرنا الشارع، توزّعَ كل واحد منا أمام نافذة، يراقب ويرصد تحركات الدواعش، في حين قررتُ صعود المبنى المدمَّر، وصولا إلى الطابق الرابع، وبصعوبة استطعت تفادي درج المبنى المتهدم، بأن صعدتها قفزاً، حتى دلفتُ الشقة.

لقد كانت الشقة تمثّل الرقة كلها في الدمار، كصورة مصغرة عنها، فكل ما فيها ممزّق، وجدرانها إما مثقّبة بفعل الرصاص، أو متشققة بفعل التفجيرات، أو منهارة، وما بقي منها لا يصلح للعيش داخلها.

توجهتُ مباشرة إلى المطبخ، كون نافذتها الصغيرة تواجه الشارع الذي استولى عليه عناصر داعش، وجعلت منه مركزا لهم.

حينها كانت غرفة المطبخ قد نالت هي أيضا نصيبها من الدمار والخراب، فعلى أرضيتها المبلطة، انتشرت الأواني المحطمة والكؤوس الزجاجية المكسورة، وتناثرت الصحون والملاعق وعبوات المونة في كل مكان، تفحّصتها أولا، فما لفت انتباهي أي شيء، سوى تلك الأشياء المرمية على الأرض، خطوتُ أولى خطواتي داخلها، متّجهاً نحو النافذة الصغيرة، بندقيتي على كتفي، جهاز اللاسلكي بيدي، وعزيمتي في قلبي على هزيمتهم تزداد كلما تقدمتُ أكثر صوب النافذة، إلا أنني سمعتُ صوتا هشّاً، وكأنني ضغطتُ على سلك ذي جرس، له نغمة يطن في الأذن طنيناً خفيفا، أو كخشخشة أوراق يابسة، سقطت من غصن شجرة ذات خريف، شعرتُ أنني في ورطة، قلت في نفسي حينها: قد تكون هذه خطوتي الأخيرة لي في الحياة.

لغمٌ لعين، موصول بسلك معدني، لا أدري كيف استطاعوا أن يخبئوه تحت الأواني المرمية على الأرض، عرقٌ بارد انصبّ من جبيني، تجمّدتُ في مكاني، كأني صخرة صماء، أشّرتُ لرفيقي الذي يسير ورائي أن يتوقف، وبالكاد صدر مني صوت متردد، قلت له بنبرة جافة لا تخلو من الرجاء: قف مكانك، لا تتقدم ولا تسمح لأحد بالحركة والتوجه نحوي، فلقد دستُ على لغم...

كان عناصر داعش يعلمون بأهمية هذا المكان، إذا ما انسحبوا منه مُجبرين، ولذلك وقبل أن يرحلوا، خلّفوا وراءهم ألغاماً مصنّعة يدوياً، كعبوات ناسفة، وخبّأوها في أوانٍ وألعاب أطفال وعبوات معدنية، أو أي شيء، وهذا الألغام مُعدّة للانفجار، ما إن تُداس، أو تتحرك من مكانها، وللأسف كنتُ أنا الضحية، أنا الفريسة التي علقتْ في الفخ، علتْ الأصوات القادمة من رفاقي، لكي يتقدم أحد الخبراء في فكّ الألغام، ويُبطل عمل اللغم، ويحررني، ولكنه لم ينجح في ذلك، رغم مرور أكثر من عشر دقائق على ذلك، تخدّرت قدمي من شدة الضغط على السلك، حتى لا يرتخ السلك من تحته، فينفجر، وبعد أن يئسَ الجميع من إنقاذي، خطرتْ فكرة غريبة من رفيق لي في المجموعة، صحيح أنها فكرة خطرة نوعا ما، وستكون لها عواقب جمّة لو لم تنجح الخطة، ولكنها على الأقل منحتني ورفاقي فسحة أمل.

كانت الخطة تقتضي بأن يقوم رفاقي بإفراغ البراد من محتوياته، وفتح بابه أمامي، وذلك لأحتمي بداخله، حين أرفع قدمي من على السلك، وأرمي بجسدي داخلهُ، اقتنعت بالخطة رغم أنها تنمّ على مخاطرة لا تُحمد عقباها، لذلك عقدت العزم على القيام بها، فهي لن تكون أخطر وأصعب من المهمات والحملات التي قمت بها، فإذا حان موعد رحيلي عن العالم، فلن يكون أجمل من أن أكون شهيدا.

حانتْ اللحظة المناسبة كي أقوم بمهمتي الأخيرة، فالثلاجة الفارغة كانت تفغرُ فمها الواسع أمام وجهي، حتى أرمي بجسدي داخله، وأنهي معاناة استمرت لأكثر من عشرين دقيقة، وما هي إلا شهقة واحدة وانفجر اللغم.

أيام لم أحصها، وأحداث لم أشارك بها، أو أصنعها، مرّت مرور الكرام في حياتي، وأنا ممدد على فراش أبيض في المشفى، أنتظر بفارغ الصبر قدوم الطبيب ليوافق على أمر إخراجي من المشفى، فأحتفل مع رفاقي، يوم اجتماعهم في الساحة العامة، وسط مدينة الرقة، احتفالا بتحريرها، لكنني للأسف تابعتهم من خلال شاشات التلفاز فقط، فلقد اقتصرت أضرار التفجير على الجهة اليسرى من جسدي، فحين حصل الانفجار، كانت الثلاجة قد حمتْ رأسي ووجهي والجهة اليمنى من جسدي، بينما يدي اليسرى إضافة إلى قدمي الأيسر الذي كان يضغط على السلك الأكثر تضرراً من هذا التفجير، ولذلك كل ما تبقّى لي من أيام تحرير الرقة، هي بعض التشوهات لتذكّرني دائما بحياتي وبمستقبلي، فمن لا جرح له، لا أمل له.

تلك البندقية، قناصة «ريدور»، تلك التي رافقتني حين عبرَ المجهول، ما زالت معلقة في صدر غرفتي، أمسح عنها غبار الذكريات، ألمّعها وأهتمّ بها، وكلما استشهد شهيدٌ، أضعها في يدِ مقاتل، وآمره أن يرفعها عاليا، ويضغط على زنادها بطلقتين، واحدة للشهيد، والأخرى لـ «ريدور».

LI ROJAVAYÊ KURDISTANÊ.. HEJMARA PÊKETÊN NEXWEŞIYA KORONAYÊ ZÊDE DIBE

Rapor: Kovara Welat

Di dawiya meha adarê de hejmara kesên ku bi nexweşiya koronayê diketin li deverên rojavayê Kurdistanê roj bi roj zêde dibû. Vîrûsa koronayê ya veguhêr kete qonaxeke nû de û hejmara kesên ku jiyana xwe bi vê vîrûsê ji dest didan ber bi zêdebûnê ve diçû.

Di 3ê nîsana 2021 de, û ji ber ku hejmara pêketên nexweşiya koronayê li bakur û rojhilatê Sûriyê zêde dibû, şaneya krîzê ya bi ser rêveberiya xweser ve biryara karantîna giştî li bajarên Qamişlo, Hesekê û Reqayê, û ya beşî li deverên dîtir ên di bin serdestiya rêveberiya xweser de derxist.

Amarên nexweşiyê di 4-4-2021 de li gorî ku rêveberiya xweser ragihandin bi vî awayî bûn:

Li tevahiya devera bakur û rojhilatê Sûriyê 3 kesan ji ber nexweşiya koronayê jiyana xwe ji dest dan, 105 kesên din bi kovîd19 ketin. Ev amar li deverên rêveberiya xweser bi vî awaî belav dibûn:

Hesekê 21 pêketî

Dirbêsiyê 8

Kobanî 14

Reqa 28

Tebqa 32

Minbic 2

Hejmara kesên pêketî ta 4-4-2021 gihişte 10509 kesan 392 kesan ji wan jiyana xwe ji dest dan.

Bi ragihandina karantînayê hêvî hebû ku hejmara pêketiyan dakeve, lê mixabin ev hejmar zêdetir bû. Sedema vê zêdebûnê ew bû ku gel pabendî bi karantînayê û awayên xweparastinê 100% nedikir. Ev jî vedigere wê yekê ku rêveberiya xweser pêdiviyên jiyanê yên sereke wekî nan û xazê ji xelkê re tabîn nedikir, lewra xelk li ser ferne û deverên firotina xazê kom dibûn bêyî ku awayên xweparastinê bi kar bînin. Ji hêleke din ve, rewşa gel ya aborî ya nebaş hişt ku gel sivikatiyê bi nexweşiyê bike û dabînkirina pêdiviyên jiyana raojane di ser xweparastina ji nexweşiyê re digirtin. Her weha çûn û hatin , seredan, şevbuhêrk û ezaxwestin berdewam dikirin. Di heman demê de û bi taybetî li bajarên Hesekê û Qamişlo, li çargoşeya ewlehî ya rêjîma Sûrî karantîna giştî nebû, û tevger li wê deverê bi xurtî berdewam bû.

Di 1-5- 2021 de û piştî ku karantîna giştî bidawî bû û em ketin karantîna beşî de amarên nexweşiyê li gorî desteya tenderustiyê bi vî

الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا
المجلس التنفيذي
الرقم : / ٨٤ /
التاريخ : ٢٠٢١/٤/٣

قرار رقم /٨٤/
بناءً على اجتماع خلية الأزمة في المجلس التنفيذي لشمال وشرق سوريا
وبناءً على مقتضيات المصلحة العامة
الرئاسة المشتركة للمجلس التنفيذي لشمال وشرق سوريا
تُقرر ما يلي:

نتيجة تزايد حالات الإصابة بفيروس كورونا في موجته الثالثة في مناطق شمال وشرق سوريا وحرصاً منا على سلامة وصحة الأخوة المواطنين فإننا نهيب بهذا الصدد كافة الأخوة المواطنين في مناطق الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا الالتزام بالإجراءات والتدابير التالية :

١- يُفرض حظر التجوال الجزئي في كافة مناطق الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا من الساعة الرابعة عصراً إلى الساعة السادسة صباحاً من اليوم الثاني وذلك اعتباراً من يوم الثلاثاء الواقع في ٢٠٢١/٤/٦ ولغاية يوم الاثنين الواقع في ٢٠٢١/٤/١٢.

٢- يمنع منعاً باتاً كافة التجمعات (الأفراح - خيم العزاء- الاجتماعات- الصلاة في دور العبادة - كافة التجمعات الأخرى) اعتباراً من ٢٠٢١/٤/٣.

٣- إغلاق جميع المطاعم والمقاهي والكافتريات والأسواق الشعبية وتقتصر عمل المطاعم على الطلبات الخارجية خارج أوقات الحظر.

٤- إغلاق كافة المدارس والجامعات والمعاهد.

٥- إغلاق المعابر الحدودية في مناطق شمال وشرق سوريا باستثناء الحالات الإنسانية والمرضى والطلاب والحركة التجارية.

٦- فرض حظر التجوال الكلي على كل من مدينة قامشلو والحسكة والرقة نتيجة تزايد حالات الإصابة في هذه المدن اعتباراً من صباح يوم الثلاثاء بدءاً من الساعة السادسة صباحاً الواقع في ٢٠٢١/٤/٦ ولغاية يوم الاثنين الواقع في ٢٠٢١/٤/١٢ ضمناً ويستثنى من الحظر الكلي (الأفران - أسواق الهال - المستلزمات - الصيدليات - محلات المواد الغذائية والأدوية - المحروقات -الفرق الطبية - المزارعين - الاعلاميين).

٧- يفرض لبس الكمامة على جميع المواطنين وفي جميع الأماكن تحت طائلة فرض الغرامة المالية المحددة سابقاً بقيمة ألف ليرة لكل من يخالف ذلك.

٨- يكون للمجالس في البلدات والنواحي بالتنسيق مع قوى الأمن الداخلي ولجان وهيئات الصحة في الإدارات الذاتية والمدنية اتخاذ قرار الحظر الكلي في البلدات والقرى التي تزداد فيها حالات الإصابة بهذا الفايروس وذلك بعد أخذ موافقة المجالس التنفيذية في الإدارات.

٩- يُبلغ هذا القرار من يلزم بتنفيذه .

عين عيسى في ٢٠٢١/٤/٣

الرئاسة المشتركة للمجلس التنفيذي
بيريفان خالد عبد المهباش

الإدارة الذاتية لشمال وشرق سورية
مجلس العدالة الاجتماعية
الرقم /١٥٠/
التاريخ ١٢ /٤/ ٢٠٢١م

قرار رقم /٣٠/
بناءً على احكام ميثاق العدالة الاجتماعية
والمصلحة العامة
وعلى القرار رقم /٩٦/ الصادر عن الرئاسة المشتركة للمجلس التنفيذي
بتاريخ ٢٠٢١/٤/١١م المتعلق بالحظر الكلي بمناطق الإدارة الذاتية لشمال وشرق سورية
أن الرئاسة المشتركة لمجلس العدالة الاجتماعية تقرر مايلي :

١- تؤجل كافة الاجتماعات الرسمية داخل مجلس العدالة الاجتماعية ومحكمة الدفاع عن الشعب والديمية ميزوبوتاميا للعدالة الاجتماعية اعتباراً من يوم الثلاثاء الواقع في ٢٠٢١/٤/١٣م ولغاية يوم الخميس الواقع في ٢٠٢١/٤/٢٢م ضمناً على ان يتم الدوام فيها بنظام المناوبات خلال الفترة المذكورة .

٢- تؤجل كافة الجلسات في دواوين العدالة بمجالس العدالة الاجتماعية باستثناء الدعاوى الجزائية خلال الفترة المذكورة

٣- تعمل كافة هيئات دواوين العدالة الاجتماعية بنظام المناوبات بواقع قاضيين على الأقل .

٤- تعتبر الفترة الواقعة من ٢٠٢١/٤/١٣م ولغاية ٢٠٢١/٤/٢٢م ضمناً موقفة للتقادم وحافظة للمهل .

٥- تلتزم مجلس العدالة الاجتماعية ومحكمة الدفاع عن الشعب والديمية ميزوبوتاميا للعدالة الاجتماعية بقواعد السلامة والتباعد الاجتماعي .

٦- يبلغ هذا القرار لمن يلزم بتنفيذه .

عين عيسى ٢٠٢١/٤/١٢م

الرئاسة المشتركة لمجلس العدالة الاجتماعية
القاضي عماد مراد الحاج القاضي ريما بركات

الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا
المجلس التنفيذي
الرقم : / ١١٢ /
التاريخ : ٢٠٢١/٤/ ٢٩

قرار رقم /١١٢/
درءاً للخطر الذي يشكله فيروس كورونا (COVID 19) ومنعاً لانتشاره
وبناءً على مقتضيات المصلحة العامة
الرئاسة المشتركة للمجلس التنفيذي لشمال وشرق سوريا
تُقرر ما يلي:

١- يُمدد حظر التجوال الجزئي المفروض في كافة مناطق الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا لمدة سبعة أيام بدءاً من صباح يوم الجمعة الواقع في ٢٠٢١/٤/٣٠ ولغاية يوم الخميس الواقع في ٢٠٢١/٥/٦ ضمناً على أن يبدأ الحظر من الساعة السابعة مساءاً وحتى الساعة السابعة من صباح اليوم التالي.

٢- يُغلق كافة المعابر الحدودية التابعة للإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا باستثناء الحالات الإنسانية والمرضى والطلاب والحركة التجارية .

٣- يُمنع منعاً باتاً كافة التجمعات (الأفراح – خيم العزاء- الاجتماعات – الصلاة في دور العبادة – كافة التجمعات الأخرى) طيلة فترة الحظر.

٤- إغلاق كافة المدارس والجامعات والمعاهد ورياض الأطفال .

٥- إغلاق كافة المقاهي والكافيتريات والأسواق الشعبية ،أما المطاعم فيقتصر عملها على الطلبات الخارجية.

٦- على كافة المواطنين الالتزام بقواعد الوقاية الصحية والتباعد الاجتماعي وارتداء الكمامة .

٧- يُبلغ هذا القرار من يلزم بتنفيذه .

الرئاسة المشتركة للمجلس التنفيذي
بيريفان خالد عبد المهباش

الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا
المجلس التنفيذي
الرقم : / ٩٦ /
التاريخ : ٢٠٢١/٤/ ١١

قرار رقم /٩٦/
درءاً للخطر الذي يشكله فيروس كورونا (COVID 19) ومنعاً لانتشاره
وبناءً على مقتضيات المصلحة العامة
الرئاسة المشتركة للمجلس التنفيذي لشمال وشرق سوريا
تُقرر ما يلي:

١- يُفرض حظر التجوال الكلي في كافة مناطق الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا لمدة عشرة أيام بدءاً من صباح يوم الثلاثاء الواقع في ٢٠٢١/٤/١٣ ولغاية يوم الخميس الواقع في ٢٠٢١/٤/٢٢ ضمناً.

٢- تُغلق كافة المعابر الحدودية التابعة للإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا باستثناء الحالات الإنسانية والمرضى والطلاب والحركة التجارية .

٣- يُستثنى من الحظر الكلي (محلات بيع المواد الغذائية والخضار) على أن تفتح من الساعة الثامنة صباحاً ولغاية الساعة الخامسة عصراً.

٤- يتم تسهيل حركة الإخوة المزارعين والأيدي العاملة معهم أثناء فترة الحظر بالتنقل من وإلى مكان عملهم بالمزارع وحقول الخضروات مع الإلتزام بقواعد الوقاية الصحية والتباعد الاجتماعي.

٥- يُستثنى من هذا الحظر (كافة المشافي- الصيدليات - المنظمات الإنسانية - الإعلاميين - الأفران - محطات بيع المحروقات) أما المطاعم فيقتصر عملها على الطلبات الخارجية فقط.

٦- يُطبق العمل في كافة المؤسسات والدوائر التابعة للإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا طيلة فترة الحظر باستثناء الدوائر التي تتطلب طبيعة عملها الاستمرار بالعمل على أن يتم تحديدها من قبل الإدارة المعنية.

٧- على كافة المواطنين الإلتزام بقواعد الوقاية الصحية والتباعد الاجتماعي وارتداء الكمامة .

٨- يُبلغ هذا القرار من يلزم بتنفيذه .

عين عيسى في ٢٠٢١/٤/١١

الرئاسة المشتركة للمجلس التنفيذي
بيريفان خالد عبد المهباش

Reqa 28

Dêrazorê 29

Kampa Roj ya penaberan 3

Ta vê dîrokê hejnmara kesên pêketî li hemû deverên bakur û rojhilatê Sûriyê gihişte 15963 , 593 kesan ji wan jiyana xwe ji dest dan, ev li gorî ragihandina rêveberiya xweser û desteya wê ya tenduristiyê ye, lê gelek kes bi vê nexweşiyê dikevin û rewşa wan di amarên fermî de nayê tomarkirin, çimkî ew aliyên fermî agehdar nakin

Hêjayî gotinê ye ku qutkitina ava Elok ji hêla Turkiyê û çeteyên bi ser ve bandor li zêdebûna pêketiyên koronayê li Hesekê dike, çimkî nepeydabûna avê awayên xweparastinê lawaz dike.

Di vê rewşa xerab de, vîrûsa koronayê metirsiyekê li ser jiyana welatiyên deverê çêdike, û metirsî heye ku rewş ji bin kontrolkirinê derkeve çimkî imkan û karînên rêveberiya xweser nagihêjên asta ku li hemberî vê vîrûsê derkevin û belavkirina wê rawestînin. Lewra pêdivî bi destêwerdaneke û alîkariyeke navdewletî heye. ■

awayî bûn:

15 kesan jiyana xwe ji dest da, 130 kesên din pê ketin, ji nav wan 83 mêr û 47 jin bûn. Amar li gorî belavbûnê bi vî awayî bû:

Hesekê 45

Qamişlo 16

Dêrik 5

Dirêsiyê 2

Çelaxa 1

الحسكة تموت عطشا

تقرير : مجلة ولات

منذ أن احتلت تركيا مدينة رأس العين (سري كانييه) الواقعة في شمال شرق سوريا بعد شنها لعملية عسكرية سميت «نبع السلام» و التي أدت الى تهجير عشرات الآلاف من سكانها و سيطرة فصائل ما يسمى «الجيش الوطني» التابع للائتلاف السوري المعارض و المدعوم من تركيا على المدينة و ارتكابها انتهاكات ترقى الى جرائم حرب و جرائم ضد الانسانية حيث سيطرت على منازل المدنيين الذين تم تهجيرهم و نهبت و خربت ممتلكاتهم و تقوم بشكل يومي بالتضييق على من تبقى في المدينة وسط فقدان شبه كامل للأمن و السلام في المدينة

لم تكتفي دولة الاحتلال و الفصائل التابعة لها بالانتهاكات اليومية لحقوق الانسان في المدينة بل تتعمد بين الفينة و الأخرى الى قطع مياه محطة علوك الموجودة في المدينة و التي تعتبر المصدر الأساسي و الوحيد للمياه لحوالي مليون و نصف مدني يعيشون في في مدينة الحسكة و الأرياف التابعة لها .بالرغم من أن استخدام المياه كسلاح ضد المدنيين تعتبر جريمة ضد الانسانية وفق الشرعة الدولية .

تزامن القطع الأخير لمياه محطة علوك من قبل تركيا و الفصائل التابعة لها مع قدوم شهر رمضان المبارك و الانتشار المتزايد لوباء كورونا القاتل في مناطق شمال و شرق سوريا مما خلق مأساة انسانية تشكل تهيددا لحياة عشرات الآلاف من المدنيين و بخاصة الأطفال و النساء و الشيوخ منهم. و مع ارتفاع درجات الحرارة تصبح الحاجة الى المياه أكثر الحاحا, لكن كل ذلك لم يخلق وازعا اخلاقيا لدى القوى المسيطرة على المدينة .

قطع المياه خلق حالة من الهلع و الارتباك لدى سكان

المنطقة الذين يركضون هنا و هناك بحثا عن قطرة ماء, وسط عجز واضح من قبل المنظمات العاملة في المنطقة و مؤسسات الادراة الذتية في تلبية حاجة السكان من المياه عبر الصهاريج و التي لا تغطي التعداد السكاني الكبير.

وسط الصمت الدولي عن هذه الجريمة و عدم استجابتهم لصرخات السكان رغم اطلاق الناشطين العديد من الهاشتاغات في محاولة لتوجيه الأنظار نحو هذه الكارثة الانسانية , يضطر السكان الى شراء المياه من الصهاريج دون التأكد من مصدر هذه المياه و مدى صلاحيتها للشرب. فأصحاب الصهاريج يقومون بجلب المياه من عدة أبيار تقع حول المدينة, منها ما تكون مياهها صالحة للشرب و منها ما لا يصلح للشرب , و لكن كما يقول المثل «الرمد أفضل من العمى»

كما أن شراء المياه يشكل عبئا اقتصاديا اضافيا على سكان المنطقة الذين يعانون أصلا من غلاء المعيشة وسط ظروف اقتصادية صعبة للغاية و ارتفاع كبير لمستوى الفقر. فسعر البرميل الواحد من المياه يعادل ألف ليرة سورية كحد أدنى, و يقوم أصحاب الصهاريج برفع هذا السعر كلما ازدادت الحاجة للمياه .

هناك فئة واسعة من السكان لا يستطيعون شراء المياه و يضطرون الى الاعتماد على مياه الآبار التي تم حفرها في المنطقة في السنوات الأخيرة , رغم أن مياه هذه الآبار لا تصلح للاستعمال و تشكل خطرا كبيرا على الصحة بحسب الأطباء و خبراء المياه.

ان استمرار قطع مياه محطة علوك الواقعة في مدينة رأس العين (سري كانييه) قد يتسبب بكارثة انسانية كبيرة و لابد للمجتمع الدولي و الدول المتدخلة في الشأن السوري أن يقوموا بالضغط على تركيا و الفصائل التابعة لها لتحييد المياه عن الصراعات السياسية و تشغيل المحطة بكامل طاقتها .



HELBESTIN GELÊRÎ JI HAWIRDORÊ CÎHANÊ

Wergêr: Şêrko Dakorî

Jiyan çi ye?
- Crowfoot, helbestvanekî ji hindiyên emerîka

Jiyan çi ye?
Çirîska gustêrkekê ye di şevreşê de
Henaseya gamêşekî ye dema zivistanî
Ew siya biçûk e ku baz dide li ser gîhê
Dema rojavabûnê, û xwe jibîr dike.

* * *

Deryaya gewre
Uvavnuk, jinek ji şamanên Eskîmo.

Deryaya gewre min dilivîne,
min bi ser avê dixe.
Min dilivîne wek gîhayê di ava cihokekê de.
Qubeya ezman min dilivîne,
Seqayê hêzdar wek bahozekê di canê min re diçe.
Radihêje min digel xwe.
Ez ji kêfa dilerizim.

* * *

Straneke gelê Eskîmo
Ez dîs diramim
bi şerûdiyên xwe yên biçûk
gava bayê ez ji kenarê deryayê dehfandim
di qeyika min de
û min got qey ez di metrisiyê de me.

Tirsên min,
Evên biçûk
Ku min digot evqasî mezin in.
ji hemû tiştên jîndar
ên ku gerek bû ez bigihama wan.

Lê belê tiştek tenê
birra gewre heye,
Ew tiştê bi tenê:
Ku mirov bijî û di kox û geştan de
bibîne gava roja gewre hiltê,
û ronahî çawa dinyê mişt dike.

* * *

Sirûdeke hindiyên emerîkî ji êla Zûnî
Ez dixwazim wiha bibe: Da ku diya me Erd
çar caran kirasekî ji ard li xwe bigerîne;
da ku gulên qeşayê wê bi temamî binixêvin;
ji bo kajên li çiyayên dûr nêzîkî hev rawestin ji sermê;
û giraniya berfê hin şaxan bişkîne.
Da ku erd wiha bibe,
min darikên xwe yên limêjê kirine afirindeyine jîndar!

* * *

Mirin
Ji kelepûrê şanişîna Kuba, Kongo.

Ti derzî bê seriyekî simtinê tine.
Ti cawbir bê tîxekî tûj tine.
Mirin bi gellek rengan tê.

Bi nigên xwe em li ser erda bizinê dimeşin.
Bi destên xwe em eznanê xwedê dihingêvin.
Rojekê ji rojan di germa nîroyê de,
Ezê li ser millan bêm rahiştin
Û di gundê miriyan re derbas bibim.
Gava ez bimrim, min li bin darên daristanê veneşêrin,
Ez ji stiriyên wan ditirsim.
Gava ez bimrim, min li bin darên daristanê veneşêrin,
Ez ji dilopên wan ditirsim.
Min li bin darên gewre yên siyê li bazarê veşêrin,
Ez dixwazim dengê lêdana daholan bê min,
Ez dixwazim bi nigên semakeran bihisim.

* * *

Emê herin ez û te
Ji stranên êla Wîntû ya emerîkî

Bi jor de emê herin ez û te
Digel riya kadizan emê bimeşin ez û te
Li ser şopa gulan emê bimeşin ez û te
Bi riya xwe de emê gulan rakin ez û te.

* * *

غيوم سوداء

أكرم محمد

كأني بأرض بحور الخراب
تمتزج مع ضباب عينيك
وتلازمني في كل حين
هنالك حيث أرقد مع الغانمات
وتلك الألوان وفرحة السماء
دعيني وسيري بعرى الأمنيات
يداعب وجودي ويهمس للغيمات
فوحدي أكون أو لا أكون
أخاطر في هودج الرياح
أراسل ذاك الحبيب الغريب
وأنتظر قرب نافذة الحلم
تغيب عني لحظات السكون

وتغادر مصابيح المساء
شرفات الذكريات
أجلس في فناء الوحدة
لأغطي انتكاسات السنين
وانكسارات الخيبة العمياء
ذريني بباب اليقين والرجاء
فلست أصارع أوهام الرياح
ولست أحصد قطرات الحنين
يحتضر الزمان
على برودة صبري فكوني
الدفئ الذي يزرف دموع الأحتضان
ولتمسي العذر مع كل اشراقة وداع
وكل ساعة فراق ■

توزع مجـــــــاناً

بسبب قطع مياه علوك

الحسكة تختنق عطشا

welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat
ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (٨١) ٢٠٢١/٥/١ م